

Divê em li hember rêwaza PKK'ê ya Lenînî ya “gavek bi li paş û du gav jî li pêş” hişyar bin

Destê bîrdoziya marksîzm- lenînîzm û komûnizmê di buyerên başûrê rojhilat de heye. Her çiqas rêxistinê ji ala xwe das û çakûç derxistibe jî, ev yek rastiyê naguherşne. Her ciwanê beriya ku derkeve çiyê, beriya ku bikaranîna çekê fêrbîbe perwerdehiya Marksîzm û Lenînîzmê distîne. Şopên vê perwerdehiyê ji axaftinên endamên rêxistinê û ji mebesta wan xeyalên wan ê li ser dinyayê jî tê fêmkirin.

Bingeha bîrdoziya marksîzm û lenînîzmê darwînîzm e. Iyangerên PKKê wisa dizanin ku jiyan ji pêkhatinên xwezayî pêk hatiye û bi îhtîmalan ava bûye. Wisa bawer dikin ku dîrok jî, ji pêkhatiya evrîmê hatiye der. Mînak Ocalan vê fikra di derbarê dinyayê de wisa tîne ziman: Eger keşfa amûr û agir pêşde biçê dê hilberîn jî zêde bibe. Û dê mesafeya di navbera PRÎMATan zêde bibe. Yasayên Evrîmê yê xwezayî vê yekê ferz dikin û diyar dikin. (Abdullah Öcalan, ji kitêba "Bir Halkı Savunmak" ji beşa "Doğal Toplum" ê jêderek)

Mirovê Homo Sapiens ê di kirûya dema me de cih digre kiriye ku civakeke modern a dema pêk be. Ev civak xwedî îrade ye. Mirovên weke heywanên kuvî dijiyan ji wê yekê xilas bûn. Hema tu bêjî weke koma heywanên pêşketî li ser piyan bû. " (Abdullah Öcalan, "Bir Halkı Savunmak" ji beşa "Ortadoğu'da Günce Durum ve Olası Gelişmeler" jêderek e)

Wateya vê şîrovêyên Ocalan a li ser darwînîzmê ev e : li gor fikra PKKê ya ku ji zanistê dur e mirov di pêşî de bê çîna mirovî bûn. Civata komûnal hebû. Û bi ewrîmê jî re bûne feodal, piştê jî bûne civaka kapîtalîst. Li gor wan civak di van qonaxan re derbas bûye. Niha jî dîsa dora sîstema komunîzmê ye. Divê ew bê avakirin. Dê vê carê ne civata koneyî ya komûnal vê carê dê civateke modern û bê çîna civakî ava bikin. Û di vê hayala wan a komînîst de giringiya malbatê, alê, dewletê namûsê tune ye.

PKK;

· Ji ber ku baweriya xwe bi darwînîzmê aniyê bawerdike ku jiyan bi tesadufan pêk hatiye. Wisa bawer dikin ku dîn jî bi dema ewrîmê pêk hatiye û beriya ewrîmê tu dîn tunebûne. Di eslê xwe de ewrîma dînan qet pêk nehatiye. Dinê heq ji roja ku însan hatiye ser rûyê dinyê ew jî her hebûye.

· Tinin ziman ku di serdemên kevinde mirovên kone, di sîstemeke jiyana komûnde dijiyan û hemû tiştê xwe bi hev re dikirin. Dibêjin bi hvere neçîr dikirin, amurên xwe bi hevra bikardînananin hevparî hebû. Û dibêjin jin jî weke malê hemû kesî dihatin dîtîn. Radigihînîn ku peyvên malbat, al, namûs niştiman tunebûn. Qaşo di ferhenga mirovên kone de peyvên malbat, şeref û namûs tunebûn. Piştê ev peyv ji hêla mirovan hatine çêkirin. Divê ev peyv ji hoê bêne rakirin. Ji holê rabûna wan jo bo komunîzê gellekî muhîm e.

Bereksî gotinên PKKê û komînîstan zanist jî eşkere dike ku mirov her tim weke mirov li ser rûyê dinyê maye. Ji heywanan neguheriyê û nebuye mirov. Ji roja ku mirvovahî avabûye heta niha mirov xwedî wîjdan in. Hêla wan amanewî û ahaqî heye. Xwedî nirxa ye.

PKK YA KOMÛNÎST OL Û DEWLET Û MALBATÊ RED DIKE

Bîrdoziya dibêje ku mirov ji tesadûfan pêk hatiye û mirov weke heywanên beradayî ye, çawa olê qebûl nake nirxên manewî jî qebûl nake. Malbatê ahlaqê xweş û dewletê jî qebûl nake.

Fikrên serokê komûnîzmê ê di vê çerçoveyê de eşkere ne. (heşayî Xwedayê gewre)

Mecbure bernameya me bêdiniyê qebul bike û vehewîne. (Lenin Külliyyatı, 1947-Moskova)

Ataîzm bo her komûnîstekî yasayek e. (<http://www.marxists.org/archive/lenin/works/1905/dec/03.htm>)

Karê meye ku em berxwedaneke bîrdozî li hember olê bimeşînin. (Pravda gazetesi, 1958)

Heta ol ji holê ranebe, dê mirov bextewar nebin. (Marx, Karl and Engels, Friedrich, On Religion, Atlanta: Scholars Press, 1964)

Komunîzm rastiyan nê ber biçav red dike. Û hemu ol û yasayên ahlaqî ji holê radike. (<http://www.marxists.orgarchive/marx/works/1848/communist-manifesto/ch02.htm#118>)

Fikra PKK'ê ya li ser olê weke ya Leninizm, Stalinizm, Marksîzm û komûnîzme ye. **PKK A KOMUNÎST MALBATÊ RED DIKE.**

Malbat no komûnîstekî ne xwedî qiymet e. û hetta gerel malbat tunebû. Lîderên komûnîst hemû li hember malbatê sekinîne û malbat red kirine. Dewlet jî red kirine. Di komûnîzmê de malbat bi van gotinan tê redkirin.

"Ji ber kîjan sedema be, şoreşgerên bizewicin malbatekî ava bikin û yê tekevin nav malbatê, di nav nakokiyê mezî de dijîn. " (Ji kovara Komünist Zemin, Sayı 4, Aile Kurumu Ve Devrimci Hareketin Bu Kurum Karşısındaki Tutumu Üzerine)

Abdullah Öcalan jî li hember malbatê ye. van fikrên xwe gellekî baş eşkere kiriye. Hemû PKK'yî jî li gorî vê fikrê hatine perwerde kirin:

(Malbat) tiştêkî wisaye ku mirov dike kol e. peywendiyê gellekî xirabe. Îro em peywendiyên yê xirab ê li gund û bajarên Kurdistanê qebul nakin. Û em ji wan peywendîyan ditirsîn. Ji kitêba (Kürdistan'da Kadın ve Aile, Abdullah Öcalan, rûpel 47) Berxwedana li hember malbatê ji bo me weke berxwedana li hember dagirkeriyê ye. çawa em li hember dagirkeriya fikran ava dikin û em li ser wê teoriyan rêz dikin divê em li hember wê jî wisa biçe wê jî ji holê rakin. Ji kitêba (Kürdistan'da Kadın ve Aile, Abdullah Öcalan, rûpel 57)

PKK A KOMUNÎST PEYVÊN DEWLET, AL, Û NIŞTIMAN RED DIKE

Komûnîzma tarafgîrê şer bawerîya xwe bi dewletê nîne. Li hemberî dewletê ye û li hemberî hemu degehên dewletê ye. vê yekê li hember rûxandina dewletê bi awayekî aktîf di posterên xwe de bikartînin.

Li gorî wan a muhîm ewe ku dezgehekê ava bikin û fikrên xwe bîrdoziya xwe li ser xelkê zal bikin. Ji ber vê yekê li cem PKKê ji ev yek heye. Tu qiymetê birayên me yê kurd li cem PKKê tune. Mebesta wan ne ewe ku mafê kurdan bistînin. Mebesta wan ew e ku êşan gellê kurd îstîsmar bikin. Û ji xwe re qdekeê ava bikin û fikrên xwe bînin ziman. Jiber ku di feraseta komûnîstî de wateya peyvên malbat, dewlet, niştiman, tune gel hene. Feraseta komûnîst difikire ku dewletê ji holê rake û sistemeke komunal ava bike sistema ji gelan pêk tê. Ji ber vê yekê gotina hemu tişt ji bo kurdan îstîsmar e. PKK mafê kurdan naporêze. Bi hemû awayî partiyeke terorê ya Leninist, Stalinist, Darwinist, komûnîst e.

BEYÎ KU BI LÎSTIKA GAVEK LI PAŞ Û DU GAV JÎ LI PÊŞ BÊNE XAPANDIN DIVÊ BERXWEDANA ILMÎ BERDEWAM BIKE

Fikra "gavek li paş û du gav li pêş" a Lenîn e. ev taktîkeke muhîm a komînîzmeê ye. Li gor vê fikrê eger hewce bike bo armacakê komînîst dikarin çend gavan bi şûn de biavêjin. Weke ku dev ji mebesta xwe berdane. Lê belê ev ne ewe ku dev ji mebesta xwe berdane. Li heviya demekêne ku dîsa keysê bidest bixin û dîsa dest bi kiryanan bikin.

Ji ber vê yekê bo xelasbûna terorê hewceye zemîna terorê diafirînê ji hoê bê rakirin. Ev zemîn û feraset e. hikûmeta me û dewleta me di van salên dawî de bi guhertinên di mafê mirovan de û di barê demokrasîyê de, zemîn û qadeke gellekî baş amadekiriye. Lê belê tenê bi pêngavên demokrasîyê, ciwanên mejîyê wan hatiyê xirab kirin nikarin dev ji çekan berdin. Ev xetere ji ser herêma rana be. Dê bidome.

Eger şervanên PKK ji holê bên rakirin jî, ji welêt derkevin jî, dê xetere terorê berdeham bike. Dê li ser herêma xeter hertim hebe. Ji ber ku bîrdoziya terorê li ser piyan dihêle hin heye.

NAXWE ÇARESERÎ ÇI YE?

FIKRA TESÎRÊ LI SER MEJÎYAN DIKE YANÎ:

"BÎRDOZIYA DARWINÎST- MATERYALÎST " DIVÊ JI HÊLA ILMÎ JI HOLÊ BÊ RAKIRIN. DEMA FERASETA KUŞTINÊ JI HOLÊ RABE, DÊ QASID JÎ LI HOLÊ NEMÎNÎN. Ev yek tenê bi berxwedana îlmî mimkûn e:

Şerê li dijî kominîzmê de divê bê eşkere kirin ku darwînîzm derewek e. ev yek bi zanistê jî re bê piştrastkirin.

Divê di kitêbên mektebê de dersên darwînîzmê bêne îptalkirin. Ji ber ku beyî hemdê xwe jî bi vê yekê xizmet ji fikra PKKê re tê kirin. Divê dewleta me perwerdehiya di bin sîwana darwînîzm û materyalîzmê de bireve diçe bide sekinandin. Eger ewrîm hat vegotin divê cewaba wê ya zanistî jî bê eşkere kirin. Divê ji ciwanan re bê eşkere kirin ku ewrim xapandineke. Ev yek bi delîlan bêne ragihandin.

Hewceye di rojnameyan de, di kovaran de, derewên darwînîzmê bêne eşkere kirin. Divê ew delîlên darwînîzmê pûç dikin ji ciwanên me yê başûrê rojhilat re bê vegotin. ew wan kovar û rojnameyan bidest xînin. Di vê çerçoveyê de hewceye di kanalên herêmî û netewî de bernamêyên televîzyonî û weşanên radyoyan divê bê dayîn. Heceye fîlm û belgefîlm bêne amade kirin. Agahiyên zanistî hewceye bê dayîn.

Hewceye fosîl li hemû deverê bêne nîşandan. Ê bi vê yekê ewrîm were pûç kirin. Hewceye konferansên dayîn û milletê be bi hin tîştan bihise. Bibe xwedî fikrek. Ev yek dê senemên di serê mirovande bişkîne. Di şûna wan seneman de divê baweriyeke tekûz a heqîqet bêne vegotin. ayetên Qurana pîroz bêne eşkere kirin. Bi awayekî îlmî û zanistî. Ev yek dive ne weke paşverûtiyê bê kirin. Divê hêla Quranê ya giyan pak û hêja baş bê vegotin ev gellekî muhîm e.

BI VÊ YEKÊ Ê BI ÎZNA XWEDÊ DÊ KOMÛNÎZM Ê TERORA PKKÊ LI SER RÛYÊ DINYÊ NEMÎNÎN.

<https://www.harunyahya.info/ku/gotar/dive-em-li-hember-rewaza-pkke-ya-lenini-ya-gavek-bi-li-pas-u-du-gav-ji-li-pes-hisyar-bin-89073>